Çêbicêkirina madeya 140 pêgîriyeka destûrî ye, ne ku sepandina îrada Kurdistanê ye

Mesûd Batêlî

Madê 140 hestiyartirîn têksta di destûrê Îraqê ku çareseriya yasayî ya wan guherînên dîmografî û pirsên erebkirinê li serdemên borî dike li hemû nawçeyên Îraqê bi giştî û li Kerkûk û Kurdistanê bi taybet. Lewra ji ber giringiya vê babetê xişteyeka katî û lijneyeka taybet bo cêbicêkirina wê hatiye danan ku bi sê qonaxan asayî kirî, amara akinciya û rapirsiyê tê dipere û divê li 31/12/2007-ê bi dumahîk bihê eve jî bi cihhatina gelên Îraqê ku hemû razî bûne bi vî rengî dawî pê bihê û eve ne sepandin û viyana Kurdistaniya ye.

Li demê berê xwe dan bo mawê destnîşan kirî bo cêbicêkirinê û ew pêngavên bo qonaxeyekê hatine havêtin ku gelek hêdî û bi bêdengî bi rê ve diçe ku eve bi tenê kujtina demêye bo cêbicêkirina wê. Ev pirsiyare serhildide ku egerên wê çine? Ji bo bersivdanê divê li ser sê tewaran rawistin ew jî fakterên navnetewî û herêmî û navxweyî ye ku ta çi astek evan hokaran rol di rêgirtina cêbicêkirina wê de heye.

Sebaret bi hokarê navdewletî: Heger em berê xwe bidinê, em dibînin ku Neteweyên Yekgirtî û Emrika û Yekitiya Ewropî û welatên di prosêsa azadiya Îraqê de pişikdar, helwîstên wan ron û aşkerane û piştevaniya Îraqa demokratî rêz li îrada gelê Îraqê didin û palpiştiya destûrî dikin û divê hemû kêşe li jêr sîbera deqên destûrî çareser bibin û çi ji wan rawistan li ser madeya 140 diyar nekirine, belku hemû jî hevhizrin ku madeya 140 tenha rêka

çareseriya aştiyane û yasayî ye û berjiwendiya navdewletî û ya welatên hevpeyman vê çendê dixwaze û eve dibe egerê seqamgêriya barê navxwe û deverê bi gîştî lewra ev hokare ne berdeste di cêbicêkirina wê de. Sebaret fakterên herêmî dibe nerastexwe bi şêweyekî sinordayî bibe asteng belam neşê destûrdana rastexwe bike û neşê rê li cêbicêbûna wî bigre, çunke Îraq dewleteka xwedan serweriya kamile û kesayetiya ser bi xwe ya navdewletî heye û Kurdistan jî pişkeke ji axê û çi dirawsiyek neşê sinorên wê bibezîne çunku sinorbezandina dewletan hevdij li gel yasayên navdewletî. Her du pirotukolên Cinêva ya sala 1977-ê ku rê li dest têwerdana navxweyî digre. Pêşilkirina serweriya dewleta berpirsiyariya navdewletî li dûv raya çawa civakê navdewletî yek helwîst li hember dagîrkirina Kuwêtê ji layê rêjîma Îraqê ve wergirt, wesa dê helwîst dihête wergirtin lewra demê hokarê navdewletî li bar be, hingê hokarê herêmî nabe rêgir di cêbicêbûna wê de.

Sebaret, hokarê navxweyî ku eve giringtirîn fakterê ne cêbicêbûnê ye, divê bi hûrî li ser rawistin û temaşe bikin ta çi rade hikûmet berpirsiyare destûriya xwe berhev kiriye bo cêbicêkirinê. Çawa pêngavan davêje. Deqên destûrî bilindtirîn desthelata yasayî di dewletê de ye. Erkê cêbicêkirina destûrî li ser milên kabîneyên yek li dûv yekê hikûmetêye û her sê desthelatên dadweriyê yasarêj û cêbicêkirin di cihînana erkên xwe de nabe hevdijiya deqên destûrî bikin û pêgiriyê di gerêxistin pabendbûn bi zemîne xweşkirin di piraktîzekirina têkstên wê de çunke destûr helqulaye. Ji hevsengkirina berjiwendiyên hevdij yên takekes, komel û pêkhate yên di civakî de ku yek paçeya wê hevbende li ser van binemayên ku destûrî de hatî, ta ku bi yeksanî û bê cêwazî hemû beşdarin di prosêsa karakirin jiyana ramyarî û xwe guncandin li gel xal û birgeyên wî bêyî ku rê bo nakokî û veqetyanê veketin, çunke ji layê yasayî ve dibine retda hevgirtina layenek bende bi cêbicêkirina van deqa, bê ku berê xwe bidine barê navxwe û herêmî û navnetewî ku dibe hindek caran bibe kosp li ser bi rêveçûna wê rêbaza hatiye helbijartin bo jiyana hevpişk ewa hatiye rêxistin û eve jî vedigre bo hindê ku pştî amedakirin û biryardan û rapirsîna gîştî ya cemewarî li ser destûrê ku vavartina rêka pêkvebûnêye dibe derbaskirina qonaxa li hev civiyanê bo diyarkirina şêweyî ku mifa bûnê. Evca her derkeftinek yan gîrobûnek di mawê diyarkiriyên vebir dibe ladan ji wan binemayên ku milet li ser rêkeftin û bê bihakirin û ne ku li berçavwergirtina îrada geliye û eve dibe egerê metirsî û

nearistekirina paşerojê û dibe derwaziyek bo destûrdana biyaniya û çêkirina derzên mezin û tirajîdî ku rê bo milmilanê û şerên navxwe di navbera pêkhateyên wê de diketin û dibe egerê hizirkirin di çareserkirin û bi dest ve înan mafan ji derveyî çarcoveya yasayî û ne dûre bibe egerê xwe vekêşana layenan û encamên nerînî wekî parçebûn û hilweşiyan bi dûv rabe darîştin û danan destûrî û yasayê li ser lapera senga wê hingê diyar dibe li demê cêbicêkirin û piraktîzekirina wane di biyavên cuda cudayên têkistên wê de ewên girêdayî bi pirensîbên serekî û di maf û erkan de ye.

Danana destûrê Îraqê belgeya hevgirtina ser ji nû ve ya gelên Îraqê ye li ser binemayên nû yên demokratiyê û hevdu qebûl bikin û parasatina berjiwendiyên hemû layan û nehêlana şûnwarên xirab yên serdemên rabirdoyî û pabendbûn bi deqên vê destûrî gerantiya yek parçeya Îraqê dike û gelê Kurdistanê jî li ser vî piransîpî bi hev re jiyana li gel Îraqa nû razî bûye ku çi sepandina û dabînkirina berjiwendiyên wê pitir di cêbicêkirina madeya 140 de xuya dibe.

Evca li vêre pirsiyara hikûmeta pitir xuya dibe di necêbicêkirina vî madeya û eve dibe pêşilkariya destûrî û ji ber ku hikûmeta Malikî hikûmeteka Itilafiye û lîsta hevpeymaniya Kurdistanê jî pişkekê serekiye di hikûmet perlemanê Îraqê de. Eve pêşilkariya ta astekê li milên wê jî ye û ew jî pişkeke ji vî pêşilkariyê, lewra du tişt ji hevpeymaniya Kurdistanê dihê xwaztin ku bikin, yan helwîstekê tund werbigre fişareka zêde li ser hikûmet û perlemanê bike bo cêbicêkirina wê yan jî divê bi zûtirîn dem xwe ji hikûmetê vekêşe, çunke li ser vî binemayî beşdarî di hikûmet û avakirina Îraqa nû de kiriye ku hemû layen pabendî di destûrî û ew rêkeftin li ser hatiye kirin li ser bi rê ve biçin. Çunke destûr jî girêbesteka ku hemû layen bi hindek merc û berjiwendiya tê de beşdar bûne ku erk û mafên her layekî tê de bi cih bihê, lewra demê layenek erkê xwe bi cih neîne eve pêgiriya layenî dîtir bi şêwey asayî ew bi xwe bi dumahîk dihê li ser wan erkên li ser milê wî, her demekî dî baceya wê de hatiye ku pêgirîkirin bi deqên destûrî gerantiya beşdarî û yek parçeyî ya Îraqê ye.

Û li dumahiyê ev encame lê dikeve ku hokarên navnetewî û herêmî çi rol di cêbicêkirina wê de nagêrin bi tenê hokarên serekî hokarê navxwe ye û eve jî berpirsiyariyeka mêjûyî ye li ser lîsta hevpeymaniya Kurdistanê û divê helwîstekê kar û piraktîkî werbigre çunke ew jî pişkekê serekiye di piroseya siyasî ya nuke li Îraqê û dê dibe cihê rexne ya dîrokî heger bi baş rolê xwe yê pozetîv di cêbicêkirina madeya 140 de negire.